

Dumahîk : Wêneyek....

Ma gelo ev ne xwekustîn bi xwe ye!! Ma kanîn hişmend, rîsipî û zana, ma kanîn ewên ku di rojên weha de li hember şer û nezaniyê deng bilind dikirin?!!, ma qey ew di civaka mirovatiyê de nemane gelo?!!

Pêwiste mirov, hemû mirov, li seranserî cîhanê, bê derengî, li dij tund û tûjiyê, li dij şer, kuştin û berberiyê dest bidin hev û serî hildin, rijandina xwîna mirovan rawestînin û ji bo aştiyê xebatê bikin. Dewletên mezin, ji bo vê armanca pîroz dikarin roleke erênî bilîzin eger ew li hin berjewendiyên xwe negerin. Lê, mixabin ku îro ew dewlet ji bo peydakirina cihê lingên xwe di devereke nû de, ew bi xwe pêl xwîna mirovan dikin û mirovatiyê bi erzanî difiroşin!!.

Hêviya min ew e ku, paşeroja nêzîk li devera me û li cîhanê bi tevayî ronî û gul bide, destê kujer û bazirganên şer û kînê têkeve bend û kelemçeyan, ew cezayê xwe bibînin, mirov û mirovatî, jin û zarok maf dê cîgehên xwe yên rastî bigrin û nema zarok ji cendirman bitirsin û xwe ji ber dîtina wan bavêjin nava dojeh û agirani!!.

În 17.06.2011

Dumahîk : Ezmûnek

dadgeha dewletan û ne jî dadgeha navnetewî ye. Di yên dewletan û navnetewî de, parêzer ji

û civakî di welêt de, li çareseriyek demiqras û dadmend ji doza Kurdî re bigerin dêvilî tewanbar berwîdide li pêş dadwer. Lê di dadgeha gelêrî de, ya ku nifşên nû dadwer in û dîrok li ser her gunehî şahid e, dimîne bê parêzer. Biryara dadgehê yan ji ser tewanbar hemî tewan têne xistin û bê guneh dibe, yan jî ta ebed dimîne gunehkarê mîlet.

Li dawiyê ezê vê mijarê bi gotina amostê xwe nemir Ismaîl Umer, Bavê Şiyar, kuta bikim: "Hişmendî û berpirsariya nîştîmanî ew e ku tevahiya hêzên nîştîmanî yên di hundir destlatê de û yên dervayî wê û çalakiyên çandî."

Dumahîk : Gelo Sûriya...

berê wê li kû ye, û dê çi bi xwe re bîne !!

Lewre jî, partiyên siyasî, rewşenbîr, bîrewer û nifşên nû, di mijûlbûn û keftelefteke dîrokî de ne, helwest, propaganda û durîsmên bi pîvan û bê pîvan têne hildan ... Lê, para mezin ji xelkê Sûriyê bêdeng, çavdêr û xweragirtî ye, xwe najotiye û xwe nedaye nav çalakiyên rikebiriya Sûrî.

Di vê çerçewê de, hêjayî gotinê ye ku, rê li ber hêz û partiyên Sûrî yên rikber, baş ne xuya, ne li hev, ne jî xwedî navend û pirogrameke kifş û zelal e.

Ev yeka he jî dihêle ku karbidestiya rijîma Be, is a serdest ji ya xwe nemîne, her û her di tund û tûjiya xwe de, di kiryarên xwe yên hovane de berdewam be. Loma jî, di vê dema nazik de, ya herî pêwîst, ew e ku, tevgera rikebir – çi kurd çi Ereb – li hev be, da ku karibe giraniyeke bi rêk û pêk, pêk bîne û rê li ber guhartina demokratîk a aştiyane veke, û li pey serberdayetiya durîşman neşimite.

Dawiya dawî, çendî rewş tevlihev û aloz be, kul û êş giran bin, rewşa Sûriyê avise, pêşeroj jî ne ji sîstema rijîma tek partiyê re ye.

Sekretêrê Parta Yekîtiya demokrat a Kurd li Sûriyê .

Keçek kurd bi cilên**kurdî bû xweşika Hollywoodê**

Keça kurd Sureya Fellah roja îne li Universal City'ye di Hotêl Hiltonê de bi cilên kurdî beşdarî merasîma hîlbijardina şacuwanê bû û bû yekem. Li gorî ajansên nûçeyan di hîlbijardina şaciwan a 2011'an li Amerîkayê, jineke Kurd bi navê Sureya Fellah beşdarî kir û pileya yekem bi dest xist.

Sureya Fellah yek ji çalakvanên Mafê Mirovan û Mafê Jinê û har wiha parêzvanê Mafê grûpên etnikî û olî ye. Her wiha



ew rawêjkar û şewirmendê karûbarên mafê mirovan e û gelek ji hevpêyvîn û daxuyaniyên wê li ser rewşa girtiyên siyêsiyên Kurd û grûpên etnikî û olî